
R:3

**Peyama Deftera Siyasî a PKDÎ**



R:5

**Beşdariya şanda PENa Kurd di 78'mîn .....**



R:7

**Rêberekî demokrat û çep**



R: 11

**Astengên Sînema û Sînemakaran**




Bidestveanîna Mafên Netewî Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal De

Hejmar: 191
21'ê Îlona 2012'an
Buha: 150 Tûmen


# Agirî


Dr. şerefkendî:

Bila dayikên kurd zarokên xwe li hembêza xwe ya germ û pir mêhr de bi hestên germ ên niştimanperwerî, welatparêzî û azadîxwazî perwerde û mezin bikin û çîroka şehîdên riya rizgariyê û çîroka şehîd Dr. Qasimlo ji wan re bêjin.


Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û giştî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistana Iranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî


## Dr. Şerefkendî:

# Bila bavên kurd dersên azadî û berxwedaniyê fêrî zarokan bikin



## Sergotar

### Bîst salên pirr ji evraz û nişîv

Şehab Xalidî

Dema ku bîst salan berî niha û rast çar salan piştî şehîdkirina Dr. Qasimlo û hevalên wî li bajarê Viyenê de , Dr. Sadiq Şerefkendî jî di gel hevalên xwe hatin şehîdkirin, êdî rejîma Îranê li ser vê baweriyê bû ku şoreşa gelê Kurd li rojhilatê Kurdistanê de, êdî derbek weha dijwar xwariye ku qet nikare li ser piyan bisekine.

Lê piştî çar salan dadgehîkirinek herî bi navûdeng ji dema şerê duyemîn ê cîhanî pêve, dadgehê ragehand ku berpirsyarên herî payebilind ên rejîma Îranê biryarderê vê terorê bûne. Eşkerebûna terorîzma dewletî a rejîma Îranê derbek bi jan li cendekê sîstema dijî mirovî a rejîma Îranê bû û bû sedema vê ku welatên endam li YE de biryara vexwandina balyozên xwe ji Îranê bidin.

Herçend ku rast çend mehan piştî vê biryarê Xatemî bû serkomarê Îranê û karî bi siloganên pirr ji riya weha nîşan bide ku azadî û demokrasiyê wê bîne Îranê, û bi vî awayî karî carek din pêwendiya Îranê li gel welatên Ewropayî ava û bihêz bike, lê piştre eşkere bû ku ji aliyekê ve li çarçoveya vê sîstemê de guhartin nayê kirin, û ji aliyek din ve rejîma Îranê berdewam bû li ser kar û kiryarên xwe ên terorîstî li nav xaka Kurdistana başûr de û li encam de zêdetir ji 150 pêşmergeyên PDKÎ û partiyên din ên Kurdistana rojhilat teror kirin.

Piştî derbazbûna bîst salan bi ser terora li Mîkonosê de, cuda ji wan hemû tehrîmên ki bi ser Îranê de hatine sepandin, dewleta Kanada bi vê sedemê ku rejîma Îranê tehlûke ye li ser ewlehiya herêmî û cîhanî, balyozxaneya xwe li Tehranê daxist. Bê guman biryarên weha cesûrane wê rojbirojê rejîma Îranê lawaz û lawaztir bikin, û partiya Şerefkendî jî berevajî pêşengê bihêz yê şoreşa li Îran û Kurdistanê de ye, û heta gihîştina bi armancên Şerefkendî dest ji xebatê hilnagre.

www.arsivakurd.org

# Bersivek kurt bi piropagandayên bijehr li dijî xelkê Kurdistanê




PDK Îran û Komeleya Şoreşgerên Zehmetkêş ên Kurdistana Îranê derheq van piropagandayên ku piştî rêketinnameya hevpar a her du partiyan li dijî wan hatine kirin, rohnkirinek hevpar bo raya giştî weşandin.

Deqa rohnkirinê bi vî awayî ye:
Li van rojên dawîn de û piştî bilavbûna rêketinnameya hevpar a PDK Îran û Komeleya Şoreşgerên Zehmetkêş ên Kurdistana Îranê tevî piştewanî û pêşwaziya berfireh, pêlek ji piropagandayên nerewa û berxwarkar ên ragihandinan jî derheq vê rêketinnameyê derketine rojevê ku pêwîstiya vê rohnkirina me wajokarên vê rêketinnameyê ji bo bîr û raya giştî derxist holê.

Parek ji piropagandaya van ragihandinan ewqas dûr ji rastî, nizm û xapîner in ku hêjayî bersivdayînek micid ji aliyê me ve nine. Ew kesên ku daxwaza tobê ji Wîlayeta Feqîh û pesna serkuta gelê kurd dikin û radigehînin ku amade ne bo hevkarî kirina di vê serkutê de destê rejîma desthilatdar a cînayetkar maç bikin heya ku bi xeyala xwe pêşî ji ji ber hev hiloşîna Îranê bigrin, çi bersivek dibe jêre were dayîn?

Xelkê Kurdistanê ev sivikatî û gefên han zor bihîstine û berçav negirtine. Lê xembarî û azara me ji şûrkêşana hin kesan e ku ji parek ji rewşenbîr û siyasiyên hilketî ên Îranê pêkhatine û niha bi daxuyaniyek nerast ve ketine tirsandin û bilarêdebirina bîr û raya giştî û feza û seqaya bigumanî û dujminatiyê li nav xelkê Îranê de belav dikin.

Wajokarên daxuyaniyê her ji pêngava yekemîn de bi durûşma ''berevanî kirin ji yekîtiyê''û ''xebat li dijî hiloşînê''anku çekek ku heya niha cinayet û serkutên rejîmê li kurdistanê de pê hatine pasawdayîn, hatine meydanê. Her manşeta daxuyaniya wan, anku parêzgarî ji serbexweyî û yekparçeyiya Îranê, destpêka her terze karek bingehîne siyasî, li ser xîmek nerast, berevaj û nedemokratîk didanê.

Bi bawera me destpêka her karek siyasî ku îro bibe bingeha yekgirtina opozîsyona hevgirtinxwaz û li pêşerojê de jî bibe esas bo danînan Yasaya Bingehîn, demokrasî, mafê mirov û pirr rengî, fermînasîna mafê betewan û pabned bûn bi pena nebirine ber tund û tûjiyê li pêwendiyên navxweyî ên xelkê Îranê ye. Berçavgirtin û pabend bûna bi wan bingehan ku dikare bi baştirîn metod yekîtiya Îran û xweseriya rastîn a welat ku em jî parêzgariyê jê dikin, garantî û dabîn bike. Cihê mixabiniyê ye ku dostên demokrasîxwaze me ku li xakên din de pesn û sitayîşa demokrasiyê dikin û ji wê sermiyanekê bi xwe desteber dikin, lê gava ku digîje Kurdistanê û mafê netewî ê kurdan, berevanî kirin ji demokrasiyê ewqas dijwar dibînin û li hember de bi awayek neberpirsane penayê dibine ber xapandina hest û kopalê gefanû bêy tu tirsek exlaqî xwe li gel tîmsarên duh û serdarê îro yekdeng û hev durûşm dikin.

Diyardeya han bi rohntirîn metod diselimîne ku li welatek pirr netewiye Îranê de reftarên durust bi pirsa netewan û bi fermî nasîna mafê wan çiqas başe bo nasîna demokrasîxwaziya rastîn.

Bi taybetî bo me cihê mixabiniyê ye ku hejmarek ji dostên wajokare daxuyaniyê tevî hevnasiyek nêzîk bi tevgera Kurdistanê û partiyên kurdî û zaniyariyên wan li ser bawer û helwesta bi dehan saliye me û piştî midehek zaf ku bi xwe jî bi xebatkarên kurd re pêwendî hebûne û herweha li derbasbûyî de jî xwe bi alîgirê mafê diyarîkirina çarenivîsê û sîstema federaliyê bo Îranê zanîne, niha her tişt ji bîr kirine û bi ......... '' cudaxwaz dibe were îdam kirin'' hevdeng bûne. Gelo hevalên han nizanin ku pêkanîna tirsek nerast derheq parvekirina Îranê, avek e ku rasterast diçe aşê rejîma Komara Îslamî û tenê xizmetê bi pêkanîna dubendî û dilsariyê li nav refên tevgera giştî a azadîxwazên Îranê dike. Ew jî li rewşşekê de ku zêdetir ji her demekê netewên Îranê bi armanca herifandina rejîma Komara Îslamî û nûkirina Îranê hewcehî bi yekîtî û bernameya hevbeş hene.

Em wajokarên rêketinnameya hevbeş a PDK Îranê û Komeleya Şoreşgerên Zehmetkeş ên Kurdistana Îranê tevî tekez û pêdagiriya dubare li ser xalên rêketinnameyê, radigehînin ku merema me dabînkirina xwastên berheq ên gelê kurd li çarçoveya Îranek azad, demokratîk, federal û sekolar de ye. Me helwesta han ne ji bo dilxweş kirina tu kesî, belkî li gor bawera xwe û li pêxem bernameya siyasî a dehan salî yên partiya xwe wergirtiye. Em bi eşkere tekezê li ser hewcehiya cihgîrkirina sîstemek federal li Îranê de dikin û em bawer in ku nîzamek han ne tenê xwastên gelê kurd û netewên din ên Îranê bi baştirîn şêwaz dabîn bike, belkî pêngavek mezin e li pêxem demokratîzekirina Îranê û qewareya siyasî a dewletê di vî welatî de û herweha garantiya herî bihêz e bo parastina yekîtiya navxweyî a civaka Îranê, bihevre jiyana aram a xelkê û parastina yekîtiya welatê Îranê ye. Tevgera kurd tu car hewla xurtkirina kerb û kîna qewmî nedaye û pêdagirî jî li ser nekiriye, belkî ji kakilek tam demoktarîk û pêşketinxwazane behremend e.

Xwastên netewî ên gelê kurd jî ku îro xwe li durûşma federalîzmê de dibînin, ji şêwazên standarde demokratîk û pesend kiriyên cîhanî peyrewiyê dike û li dijî tu netewe, ziman û çandekê nebûye, belkî li dijî pêkhateya nedemokratîk û totalîtera dewletê li Îranê û serketina xwe jî li pêkanîna guherînkariyên demokratîk li welat de dibîne, nek ji riya dujminatiya bi tu beşek din a civaka Îranê.

Em bi piştgirêdan bi piratîka dehan saliye xwe, tekez li ser vê yekê dikin ku Kurdistan çepera qahîme azadîxwazî û demokrasîxwazî li Îranê de bûye û li rewşên herî dijwar de jî ji dostayetî û hevkariya bi xebatkarên seranserê Îranê re xwe neparastiye, belkî hertim piştewanê gişt azadîxwazên Îranê bûye.

Îro jî nizîkî û hevkariya berdewam a partiyên xwedî ezmûn û bi pêşîne ên kurd ku pêgeha herî bihêz li a xelkî û piştewanî û bawera xelkê bi wan re ye, li çarçoveya vê rêketinnameyê de, eniya xebat li dijî serberedayitiya hakim li Îranê de bihêz dike û dikare wek eniyek bihêz li pêkanîna her terze hevalbendiyek opozîsyona demokrasîxwaze Îranê rola xwe bilîze. Lewre dibe li rastî de bi pêşwaziya opozîsyona demokrasîxwaze seranserî ber bi rû bibe û bi destpêkek baş bihê dîtin.

Em tevî rêz û hurmeta tewaw bo hemû van hevalên ku li hember van gefên nerewa de berevanî ji gelê kurd û xwastekên berheqe wê û partiyên kurdistanî kirine, ev ajîtasyona dujminane ku li dijî gelê kurd û partiyên wê ketiye rê, mehkûm dikin û li ser vê baweriyê ne ku ziman û piropagandayek weha neberpirsane û nedemokratîk, tenê seqaya siyasî bijehr û aloz dike û ji hemû aliyekê ve tundajotiyê xurt dike û tevgera azadîxwazî û dijî serberedayiya giştî li Îranê de aloz dike. Lewre daxwaz ji hemû rewşenbîr, kesatî û hêzên siyasî dikin ku serbarê mehkûmkirina van teblîxatên bijehr, alîkariya cihgîrkirina feza û seqayek guncaw ji bo diyaloga avaker û aram bidin.

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**

**Komeleya Şoreşgerên Zehmetkêş ên Kurdistana Îranê**

**27' Xermana 1391 a Rojî**

## Li Pêrlaşêzê 17'ê Îlonê hat bîranîn



Roja 17'ê Îlonê, rê û resmek ji bo bîranîna Dr. Şerefkendî û hevalên wî li Goristana Pêrlaşêzê bi beşdariya birêz Mistefa Hicrî, Sekreterê giştî ê PDKÎ û hijmarek ji kesayetiyên siyasiye Kurd, birêve çû.

Birêz hicrî di wê rê û resmê de gotarek pêşkeşî beşdarbûyan kir.

Piştî 2 demjimêran civîna han dawî bi karê xwe anî.

Hûn dikarin deqê axavtina sekreterê giştî ê PDKÎ birêz Mistefa Hicrî di malpera kurdistanmedia.com de bibînin.

## PDKÎ bi hevalên cûdabûyî re rûnişt

**Heyetek payebilind a PDK Îranê bi serperestiya birêz "Mihemednezîf Qadirî" bi awayek fermî li gel hevalên cudabûyî rûniştin.**

Roja Sêşemî 18'ê Îlona 2012'an, heyetek PDK Îranê bi serperestiya birêz "Mihemednezîf Qadirî" Endamê Deftera Siyasî seredana hevalên cudabûyî ji PDK Îranê kir û ji aliyê heyetek hevalên berê bi serperestiya birêz "Mistefa Mewlûdî" hatin pêşwazîkirin.

Di vê rûniştina fermî de, birêz "Mihemednezîf Qadirî" armanc ji wê seredan fermî ku hewildan bo çareseriya pirsgirêkan bi riya diyalog û girîngîdan bi vê rêkara ku xizmet bi yekîtiya PDK Îranê û tevgera mafxwazane a xelkê Kurdistanê dike.

Piştre birêz "Mistefa Mewlûdî" keyfxweşiya xwe ji vê seredanê re, nîşan da.

# Peyama Deftera Siyasî a PDKÎ derheq bîstemîn salvegera şehîdkirina Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî




Hemwelatiyên birêz!
Xûşk û birayên xweştevî!
Beşdarên hêja!
Mêhwanên birêz!

Îznê dixwazim ku ji aliyê Deftera Siyasî a PDK Îranê ve, pir bi dil bixêrhatina we bikim û sipasiya beşdarbûna we li 20'emîn salvegera şehîdkirina xortê jêhatî yê gelê kurd, Dr. Sadiq Şerefdkendî (Kak Seîd), Sekreterê Gişrî yê PDK Îranê û hevalên wî bikim ku ji aliyê terorîstên rejîma Komara Îslamî a Îranê ve, li welatê Alman hatin şehîdkirin. Beşdariya we di vê rê û resmê de, ji aliyekê ve, rêzgirtin û derbirîna hesta pîroz û mirovdostaneya we ye li hember wan xebatkarên partiya me û ji aliyê din ve, nîşandana kerb û bêzariya we ye li hember terorîzma Komara Îslamî û biryarderên wê tawana mezin.

Beşdarên hêja!

Di dawiya sala 1371'an de, rêberê jêhatî yê partiya me bi merema birêvebirina hindek erkên siyasî ber bi Ewrupayê sefer kir, û bo beşdarîkirin di Kongreya Întêrnasyonal Sosyalîstê de, çû bajarê Bêrlînê, Kak Seîd ku serokatiya şanda PDK Îranê dikir, di heyamê karê kongrê de bi awayek baş û guncav li dor bas û babetên kongrê û rewşa siyasî a Îranê û pirsa Kurd û siyasetê dijî mirovî ên Îranê axaft.

Piştî bidawîhatina karê kongrê, beşa duyemîn a sefera vê pêkhatibû ji hevdîtina di gel beşek ji opozisyona Îranî. Bi vê mereme jî Restorana Mîkonos li bajarê Bêrlînê hatibû destnîşankirin.

Kak Dr. Seîd û şanda digel de, ku pêkhatibûn ji Kak Fetah Ebdulî, Endamê Komîteya Nawendî û Nûnerê PDKÎ li derveyî welat de, kak Homayon Erdelan nûnerê PDKÎ li welatê Almanê û Nûrî Dehkordî Çalakê siyasî û dostê PDK Îranê. Piştî gehîştina wan bo cihê civînê û piştî heyamek kurt mixabin, terorîstên ser bi rejîmê ku li mêjve bi hewla weşandina derbekê li Kak Dr. Seîd û hevalên wê didan, xwe gehandin cihê civînê û gelek bi bêrehmî hevalên me xistin ber destrêja çekên xwe, û şehîd kirin. Bi encamdana vê tawanê rêberên rejîma Tehranê, cînayetek din ya hovane û tirsnak derheq gelê Kurd û partiya me yê encam dan.

Rêber û terorîstên Komara Îslamî a Îranê di demekê de ku gelê Kurd û PDK Îranê hêşta birîna bi êş û elema şehîdkirina rêberê navdarê Kurd Kak Dr. Qasimlo û hevalên wê li bajarê Viyenê sarêj nekiribû, cinayetek din bi şehîdkirina rêberê jêhatiyê partiya me xulqandin. Piştî encamdana vê tawana weha mezin, polîsê hişyar û dezgehên ewlehiyê bilez destbikar bûn û karîn qatil û terorîstan bigirin û bidin dozgariyê. Di encama lêkolînan de derket ku ev tawane jî ji aliyê mirovkujên rejîma Komara Îslamî a Îranê û herweha bi biryara rêberên wê ve hatiye birevebirin.

Belavbûna nûçeya karesata şehîdên Mîkonosê, bûye yek ji nûçeyên girîng di medyayên navnetewî de, û li ser asta navnetewî û ji aliyê welatên pêşketî û kor û komelên siyasî û mirovdost ve hat mehkûmkirin û hevderdî û hevxemiya xwe ji PDK Îranê û malbatên serbilind ên şehîdan re ragehandin.

Li dor vê yekê kesatiyê siyasî û naskirî ê Ewrûpayî, Dr. Bêrnard Koşnêr, Wezîrê Karubarên mirovî yên welatê Feransayê û dostê emegnasê PDK Îranê û gelê Kurd, bi çavek tijî rondik û dilek pir ji hesta Însanî, di rê û resma bi axê sipartina termê şehîdan li gorîstana pêrlaşêzê di dema axaftina xwe de got: Qatil heman qatilên berê ne, li gorî ji heman goriyên berê, çiqas li serxwe guhertin bi ser dunyayê de tê, riya edalet û azadiyê çi riyek dirêj û pir ji gora hevalên me ye.

Dr. Koşnêr di dawiya gotinên xwe de bi zimanê Kurdî got: Birayên min xebata we xebatek berheqe, ev xebate xebata mine jî, tu caran we ji bîr nakim, bijî azadî, bijî demokrasî.

Xûşk û birayên birêz!

Eva hest û soza wî kesatiya weha mirovdost bû li hember şehîdan û gelê Kurd de, li hember vê yekê de jî, rêberên Komara Îslamî weke Gurên birçî fetwaya cîhadê li hember gelê Kurd û biryara terora rêberê PDK Îranê û têkoşerên riya azadiyê didin.

Beşdarên birêz!

Darêtina pîlana terora Dr. Seîd û hevalên wî, ji aliyê rejîmek dîktator û dil bi kîne weke Komara Îslamî ve dihat çavnihêrî kirin. Ev rejîma terorîstperwer bi vê xeyalê rêberê me yê mezin, Kak Dr. Qasimlo teror kir ku PDK Îranê û bizava azadîxwaziya xelkê Kurdistanê biçok de bîne, lê xûya ye ku rêberên terorîstperwer ên Komara Îslamî ders ji dîrokê negirtine û bi şehîdkirina rêberek PDK Îranê bi dehan xortên têkoşer ên Demokrat ku qutabiyên rêbaza Pêşewa Qazî Mihemed, Dr. Qasimlo û Dr. seîd bi hişyarî ve dirêjîderê rêbaza wan bin, herwekî piştî şehîdkirina Dr. Qasmlo, Kak Dr. Seîd weke yadigarek bi ezmûn ya Dr. Qasimlo, nîşan da ku PDK Îranê her berdewam siwarê qada xebat û berxwedanê ye. Piştî şehîdketina Dr. Seîd jî bi xweşî ve xewnên rêberên Komar Îslamî nebûn rastî, PDK Îranê ji hemû aliyekê ve xwe rêxist û micidtir ji caran dirêjiyê bi xebata rew ya gelê me bidin.

Beşdarên hêja!

Axavtina li ser Dr. Seîd û xizmetên wî bi PDKÎ demeke zaf dixwaze, tenê ez dikarim îşarê bi komek dîtingehên wî ên siyasî û pirensîpên şoreşvanî û buhayên mirovê ên wî bikim, navbirî li sala 1352'an ji riya Dr. Qasimlo ve xebata xwe ya siyasî û teşkîlatî dest pê dike, çalakane pileyên teşkîlatî û rawêjkariya komîteya nawendî û endamê deftera siyasî û cihgirê sekreterê giştî û li encam de sekreteriya PDKÎ birî, û wek rêçberekî jêhatî û sîmayeke naskirî li astê navnetewî de û tevgera Kurd û tevgera azadîxwaziya Îranê de hate nasîn,

Di warê siyasî û hizrî de baweriya kûr bi Dr. Qasimlo hebû, wek ogireke rêbaza Dr. Qasimlo pêdagirî li ser parastina binemayên siyasî û netewî ên PDKÎ dikir.

Li pûçkirina pîlan û siyaseta ji rê derxistina PDKÎ de ji aliyê neyarên partiya me mil bi milê Dr. Qasimlo xebata kir û wek kelek qahîm li piştê sekinî,

Li ser vê bawrê bû ku partiyek siyasî wê demê dikare bigîje armancên xwe ku xwediyê rêkxistinak siyasî û bi bîr û bawer be, bi diruşma rêkxiraw çeka herî girîng ya me ye, bi kiryar girîngî didayê, û hewla perwerdeya siyasî ya endamên hizbê dida.

şanazî bi pêşmerge bûna xwe ve dikir û li ser vê bawerê bû ku pêşmerge wek remza rizgarî û parastina gel û nîştiman kar û kiryarên wê divêt li asta PDKÎ de be, û bi kiryarên xwe şoreşgeriya xwe biselimîne wî bi Kurd bûna xwe şanazî dikir, parastina şunasa netewî jêre li ser wey her îdeolojiyekê de bû, ew li ser vê bawerê bû ku mirovê şoreşgêr re selimandina şûnasanetewî girîng e, paşan dakukî kirin li ser xelkê din. Her li vê dîtingehê ve bû ku komnivîsek ji şoreşên hemû parçên Kurdistanê û ezmûnên bi nirx ên wan serhildanan nivîsî, û niha jî wek waneyek netewî giringiya xwe heye.

Dr. Seîd li ser vê bawerê bû ku hem li astê Kurdistan û hem jî li astê sertaserî de pêkanîna pilatformekê bi hewkariya hêzên siyasî, û paşekeşe kirina bi dîktatoriyê û rûxandina rejîmê hewcehiyek siyasî ye. Her li gor vê dîtingehê ve bû ku wî hewla pêkanîna kombûna mîkonosê da, ji riya hevxebatiya opozisyona sertaserî de canê xwe li pêxema armancên pîroze gelên Îranê û demkrasiyê de pêşkêş kir. Ew rêberê mezin ji bilî wan xalên ku hatin bas kirin, baweriy kûr bi dadperwerî û yeksaniyê hebû, rêz ji mafê jinan digirt, û bawerî bi pêgehandina lawan û beşdariya wan li karê siyasî de hebû. Herweha wek kesayetiyteke zanistî girîngî dida tevgera xwendekarî. Û hewil dida pêrewên wê tevgerê li dewra siyasetên PDKÎ kom bike.

Kak Seîd li heyamê nêzîk bi 20 sal xebata bê rawestiyan li nav PDKÎ de bû xwdiyê ezmûnek zaf û li erk û berpirsatiyên xwe de nimûna rêberekî serkevtî bû, li piraniya organên hizbê de rolê wî diyar bû, wek mûdîreke serkevtî, rêberekî xwedî helwest û biryarder bû.

Şehîdekî din ê Karesata mîkonosê heval Fetah Ebdulî Enadmê Komîteya Nawendiya PDKÎ û nûnerê PDKÎ li dervey weat bû, ew yek ji tekoşerên PDKÎ bû ku li heyamê xebata xwe de erkên xwe bi başî bi cî gehandin, û wek kadrek serkewtî berpirsatiya derveyî welat pê hat sipartin û heya dema şehîdbûna xwe bi ew qasê dilsojî ve xizmet bi armqncên PDKÎ kir.

Qurbaniyek din ya vê bûyerê kak Homayon Erdelan bû, kadrek payeberz û nûnerê PDKÎ li welatî Alman. Ew kadrek bi pirensîp ê PDKÎ bû. Li heyamê karê xwe de gelek serkevtî bû.

Kesayetiyek din jî ku li vê pîlanê de şehîd bû, heval Nûrî Dêhkordî dostê kevnar ê PDKÎ û xebatkarê riya azadiyê bû. Ew jî yek jê xebatkarên pêdagir ên



Birêz Mihmednezîf Qadirî:

# Şerefkendî wek ogireke rêbaza Dr. Qasimlo pêdagirî li ser parastina binemayên siyasî û netewî ên PDKÎ dikir



Kurd û PDKÎ û siyasetên rejîma Îranê bikin, em digîjne vê encamê ku rejîm li astê navxweyî û navnetewî de di gel kirîzek zaf berbirû bûye.

dijî PDKÎ de bû ku mixabin ew jî çû refa şehîdên hizb û gel de.

Xûşî û birayên rêzdar
Guhdarên birêz
Hwe wek min qala wê kir dezgehên pêwendîdar ên Alman karîn, bi bê derfetdana bi bikujan zû terorîstan bigrin û radestî dadgehê bikin, rêberên rejîmê ku darêjer û biryarderên vê pîlanê bûn, hemû hewlên xwe li riya kanalên bi nav dîplomatîke xwe bo pare hêlana lêkolînan xistne ger.

Herwek Birind Îşmît Bawêr wezîrê rawêjkar bo karûbarê emniyetî ê Alman ku li dema lêkolîna dadgeha bilind ya Birlînê de wek şahid qise kir, ew yek piştrast kir ku yek ji biryarderên terora li Mîkonosê Elî Felahiyan gelek hewil daye ku pêşiya pêkanîna vê dadgehê bigre, lê her wek me bas kir dadgeha Alman cesûrane riya xwe pîva û aqibet li roja 10.04. 1997 a Zayînî piştî nêzîk bi pênc sal lêkolîna hûr û bê alî biryara dîrokî û mirovdostane a xwe ragehand, li vê biryara cesûrane de navê bikujên vê tawanê ku rêberên rejîma komara Îslamî ne, û li pileya herî bilind de ne, bi raya giştî da nasandin, û perde li ser vê cînayeta rejîma Komara Îslamî vêde da û esliyeta vê rejîmê ji raya giştî re eşkere kir.

Biryara dadgeha mîkonosê li gellek waran de giring e.

- Ya yekem ew e ku dadgehê serbixweyiya biryardanê û serweriya yasayî a xwe selimand.
- Ya duyemîn ew bû ku buhayên mirovî ên xwe parast û berevanî ji şehîdên serbilind kir ku bêrehmane hatibûn şehîd kirin.
- Civatgeha navnetewî hejand û welatên demkratîk û pêşkevtî balyozên xwe bo welatê xwe vexwandin, û pêwendiyên xwe bo heyamekê bi rejîma Îranê re ragirtin.

Ji hemiyê giringtir biryara dadgeha mîkonosê qonaxek nû bona eşkerekirina esliyeta terorîstiya rejîmê û perawêzxistina wê li asta navnetewê de bû, û niha jî ew helwest wek çavkaniyeke bawerpêkirî selmênerê terorîstbûna vê rejîmê ye.

Xûşk û birayên hêja!
Heke piştîderbazbûna bîst salî bi ser şehîdkirina Dr. Seîd û hevalên wî em nirxandine hûr li xebata gelê

Lê li hember de jî PDKÎ piştî şehîdbûna Dr. Seîd bi moraleke şoreşvanî ve dirêjiyê dide xebata xwe û li gorî guherînên siyasî, û bi siyasetek rastbînane ve rolekî bi bandor li qada xebata siyasiya Îran û Kurdistanê de dilîze, û herweha ciyê baweriya xelkê û hemû azadîxwazên welat e. Pêkanîna kongireya neteweyên Îrana federal, girngdan bi diyalog û hewkariya di gel hêzên siyasî ên Îranê, guhertina bîrû rayan li gel hêzn siyasî ên Kurdistanê û hewildan bo yekgirtinek giring, û îmzekirina rêkevtinnameya hawkarî li gel Komeleya Şoreşgêr a Zehmetkêşên Kurdistana Îranê, û beşeke berçav ji kar û tekoşîna PDKÎ ne.

Her wek em dizanin li çendîn dadgehên rojawayî de jî biryara terorîst bûna rejîmêî hate dan û evne jî çend mînakên eşkere ne. Hukmê dageha Parîsê li ser terora Dr. Şapûr Bextiyar, dadgeha Arjantîn li ser teqandina nawenda ferhengî a cihûyan, dadgeha Mîkonos li ser terora Dr. Seîd û hevalên wî.

Helwesta wan dawiyane ya dewleta Kanad û veqetandina pêwendiyên dîplomatîk li gel rejîma Îranê û derkirina bi nav dîplomatên rejîma Îranê ji welatê xwe, û gazîkirina dîplomatên xwe li Îranê bi nîşaneya terorîstbûna vê rejîmê û hewkarî kirina li gel rejîma Beşar Esed ku mînaka nû ye, û herweha bersivnedana rejîmê bi welatên rojawayî û bêencam bûna kombûnên Konseya Ewlekariya NY, li ser çekên navikî bû sedema vê ku ji aliyê YE ve biryara tehrîman li ser Îranê çirtir bikin, û rewşa siysî û aboriya rejîmê berev vê hindê bibin ku nekare dirijyê bide vê siyasetê.

Rêzdaran!
Li heyamê çend rojên borî de bi sedema bilavbûna fîlmeke bê rewişt û dijî sîmayên pîroze Îslamê ji aliyê kompanyayeke rojawayî ve pêla nerizayetiyan li welatên Erebî û Îslamî de dest pêkir. Li wan meşan de xelkê nerazî û aliyên Îslamî û tundrew êrîş kirine ser balyozxaneya DYA, û welatên rijawayî. Li wan êrîşan de balyozê Amerîka hate kuştin û çend kesên din jî hatin kuştin û birîndar kirin.

Em her tiştek ku sivikatîkirina bi buhayên pîroze mirov bi mher bîrûbawerekê ve be, mehkum dikin û her kiryarek ne diciyê xwe de, û êrîşên terorîstî ên ku bi navê dînê Îslamê tê kirin, bo ser balyozxaneyan û kuştina balyozê DYA mehkûm dikin û kiryarên weha bi dûr ji rê û cihên dîplomasî û yasayên navnetewî dizanin û li ser vê bawerê ne ku em cure kiryarane tenê li xizmeta rejîmên dîktatore herêmê de ne ku li hewla ji rê derxistina rêbaza pêşkewtî ya xebata gelên azadîxwaze herêmê û piroseya demokrasiyê ye.

Xûşk û birayên birêz
Li bîstemîn salvegera terorkirina rêberê jêhatî ê PDKÎ de, Dr. Seîd û hevalên wî de em cardin peymanê nû dikin ku heya gihîştina bi armancên Kurd û şehîdan xebata wan bidomînin û alahilgirê rê û rêbaza pirr ji şanazî a wan bin.

**Her tim bilind û birêz be, yad û bîra rêberê şehîdê gelê me Dr. Seîd û hevalên wî**
**Hiloşe rejîma komara Îslamiya Îranê**
**Serkewe tevgera azadîxwaziya gelê Kurd**
**Her bijîn**

# Niqurçk

## Mela bêt? Bila bêt



Ceifer Mubeşirniya

Ser çavê mela dan, bacankek dîlemanê a negehiştî ser şîn bû.

Ji bo nivîsandina tenz û tîdalan, mirov hin tiştan jê zêde dike ku bikeve qada henekan, lê birastî a wê carê hatî serê mela, tu tiştek nehewce ye, tenê axaftinên mela piştî êrîşa keçek vêrek bo ser wî xweştemaşeyeke ne ji hisaban.

Seyd Elî Beheştî melayê "Emir Bi Meirûf û Nehî Ez Munker" yê nûnerê rejîma Xamneyî li bajarê "Şehmîrzad"ê, dema ku di riya mizgeftê de bû, du keçên xweşik xwe xemilandibûn ji bo eyda Remezanê, mela ji wan re dibêje: Keçê xwe binixêve piça te dixuye!!!!

Keçikê jî gotê: Mela ger tu nexwazî pirça min bibînî, çavên xwe bigre!!!!

Ji mela re pirr nexweş bû û hin axaftinên kirêt gotnê, keçikê jî nekir namerdî "hincikek" ji mela xist û mela "zît" kire erdê de, û siwarî serê mele bûn, mela jî di çirkeya yekemîn de hesta xwe xweş kir, lê dema keçikê bi boksan li dev û limûr û çavên mela xistin, û kirne kîseboks, mela aga ji hestên xwe nema û bû keleeeeeş.

Mela bi çavê mîna beqa çêlekê pêlêkirî û pelçiqî, rabû derbasî mizgevtê bû ji bo pêşnimêjê!!! Xelik pêdikenî, lê mela wa hest dikir ku ji şerrê "Kerbela"yê vegeriyaye.

Mela ji hişên xwe çû û rewşa wî bû rewşa "xiro".

Wêca mela aqil nebû, di got û bêjekê de dibêje, gerek hêzên nîzamî wan keçên bi gotina wî "bêhicab" ceza bikin û rê nede keçan xwe bixemlînin. Mela got ku niha ez rewşek nebaş de me û ji bo xwarina firavînê min hewcehî bi jina xwe heye!!!

Herê dinyayê... tu bo kesê mal ninî. Wallahî mela çi ji tere bêjim? Serê babê te çi hatî serê te ji kîsê bavê te çû.

Wêca serê xwe danê berxwe û rojê du caran here pêşnimêjiya xwe bike û bi bêrikan Dolarên xwe kom bike.

Xwedê mela heke tu weha nekî ,keçên leheng ên mîna dewarên mendêxwarî wê tozê ji te rakin û te bikin meymûn.

Ew melayên ku guhê xwe nedan min û ji bo parastina kursiya xwe rewşa netewe û welatekê tevlîhev dikin, niha bûne kirso û zarok jî tilikan didinê.



# Beşdariya şanda PENa Kurd di 78'mîn Kongireya PEN Internastional de



**Ebdulah Hicab**

78 mîn Kongireya PEN International, bi beşdariya 300 nivîskaran ji 143 navendên PENên cuda ji 102 welatên cîhanê rojên di navbera 10.09. heya 15.09.2012, li bajarê Gyeongju a Korea Başûr birêve çû. Rojeva serek ya Kongireya îsal "Wêje, Mediya u Mafê Mirovan" bû. Li ser navê Navenda PENa Kurd, endamên Komîteya Birêveberiya Giştî, rêzdaran Bêrivan Dosky u Abdullah Hicab beşdarî kongireya îsal bûn.

Roja yekê ya Kongireyê bi axaftinên vekirinê, basên giştî li ser mijarên serekeye Kongireyê u kurte raporên di derbarê xebat u çalakiyên Navendên PENên cuda de derbas bû. Axaftinvanên sereke Gilwon Lee serokê PENa Korea Başûr ku di heman demê de xanexwê kongireyê jî bû, John Ralston Saul serokê PEN International, Kwangshik Choe wezîrê Kultûrê yê Koreya Başur u çend nivîskar u kesayetiyên dine navdare cîhanî bûn ku di axaftinên xwe de giringî dane erkên serekeye PENa Navneteweyî di warê parastina azadiya raman u raderbirînê de. Her weha xwediyên xelatên Nobel di wêjeyê de, her du nivîskar Wole Soyinka u Jean Marie Gustave Le Clezio weke mîvanên taybet beşdarî Koingireyê bûbûn u di gelek munasibetan de axaftin. Her du nivîskarên bi navudeng di axaftinên xwe de giringiya wêje u nivîsê ji bo parastina nasname u kesayetiya tak u civakan di cîhana nû ya pir li teknolojî de anîne ziman.

Âiştî axaftinên vekirinê u rêuresma fermî, raporek li ser xebat u çalakiyên navendên PENên endam di PEN International de hate pêşkêş kirin. Di beşa xebat u çalakiyên navendên PENên beşdar de beşek jî li ser xebata Navenda PENa Kurd di warên ziman, azadiya raderbirîn u rewşa nivîskarên Kurd di girtîgehên welatên serdest li Kurdistanê de bû.

Di roja duyemîn a Kongireyê de, civînên her 4 komîteyên PEN a Navnetewi bi awayê cuda ji hev birêve çûn. Şanda PENa Kurd di axaftinên xwe de li her çar komîteyên Jinan, Mafê Ziman u Wergêrê, Aştî u Nivîskarên di Girtîgehê de basî bandora rewşa siyasiye Kurdistanê li ser wêje u zimanê Kurdî u rewşa nivîskar u rewşenbîrên Kurd kir. Basa sereke di Komîteya Jinan de li ser bandora pêvajoya nûye siyaî li Rojhilata Navîn li ser rewşa jinê u hegera sinûrdartirkirina azadiya di serî de sinûrdare jinan bû. Ji aliyê şanda PENa Kurd ve li Komîteya jinan baseke berfireh li ser rola jina Kurd di pêşketinên siyasî u civakî de hate pêşkêş kirin. Di wê basê de hatibû: Di gel astengiyên ku li ser riya xebat u çalakiyên jinan hene, ew bi biryar di qadên cudaye têkoşînê de kar dikin u heya niha karîne hin guhartinan bidin pejirandin. Lê di gel wê hindê jî hê astengikyên civakî hene, serbarî wan astengiyan welatên serdest li Kurdistanê jî di şerê li dijî gelê Kurd de pitir hewl didin ku kesayetiya jina Kurd bikin armanc.

Di Komîteya Aştiyê de besî şerê ku Îro li Bakûrê Kurdistanê birêve diçe u bandora wê li ser jiyana gelê Kurd hate kirin u dubare daxwaz hate kirin ku Komîteya Aştiyê bi awayek çalak ji bo pêşvebirina hizra aştiyê, şiyan u derfetên nivîskaran bikar bîne. Her wisan basî şerê li Sûriye u bandora wê li ser gelê Kurd u şerxwaziya Komara Îslamî u zextên li ser gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê hate kirin u rewş bi awayek berfireh ji bo nivîskarên beşdar di Komîteya Aştî ya PEN a Navnetewi de hate bas kirin.

Komîteya Aştiyê biryarên xebata xwe ya îsal u pilana karê pêşerojê pişt re pêşkêşî civîna Civata Giştî kir. Di niqaşên di derbarê wê mijarê de bas hate kirin ku ew komîte wê li ser pirsa aştiyê u erka nivîskar u rewşenbîran di dema pêş me de pitir kar bike. Di basên îsal de kêmasiya ku ji ber amadenebûna şanda PENa Kurd di civînên salane ya Komîteya Aştiyê de hatibû pêş ku li derdora heyva Gulanê li Bled a Sloveniya tê girtin, bi eşkere li ber çav bû. Di gel wê yekê jî şanda PENa Kurd karî bas u niqaşên ku hatibûn amade kirin biguhere. Pişti nerazibûna şanda Kurd ji zimanê derbirîna daxuyani u manifestoyên Komiteya Aştiyê, ku bi awayek aşkira u hêjayî giringya meselê basê rewşa li Kurdistanê nekiribû, biryar hate dan ku metna dawî belav nebe heya ku li sala bê li Bled dîsa tê nîqaş kirin. Di wê derbarê de pêwîste ku PEN a Kurd agahiyên pêwîst u daxwazên xwe berya civînan ji Komîteya Atiyê re bişîne.

Basên sereke di Komîteya Mafê Ziman u Wergêrê de li ser wan astengan bûn ku dewletên Turkiye, Îran u Sûriye danîne pêş zimanê Kurdî. Di basên li ser wê mijarê de hate tekez kirin ku di gel wan astengiyan jî gelê Kurd zimanê xwe yê zikmakî parastiye, kariyê tekstên xwe yên dîrokî vejîne u ziman u wêjeya xwe bigehîne asta zimanên zindiye cîhanê. Lê ji bo ku zimanê me heman derfetên ku zimanê gelên cîran bi dest xistiye bi dest xwe ve bîne, pêwîste ku siyaset u nêzîkbûna dewletên serdest li Kurdistanê di derheqa gelê Kurd de ji bin ve were guhertin u mafê gelê Kurd bi awayê destûrî were misoger kirin.

Li ser rewşa nivîsakrên girtiye Kurd di girtîgehên Îran u Turkiyê de, basek berfireh li Komîteya Nivîskarên di Girtîgehê de hate kirin. Di wê basê de bi teaybet li ser rewşa serokê Rêkxistina Mafê Mirove Kurdistanê, rêzdar Muhemed Sedîq Kebûdvend raweste hate kirin u Komîte bi awayek berfireh ji rewşa Kebûdvend hate agadar kirin. Dema rewşa nivîskar u xebatkarê Mafê Mirovan Muhemed Sedîq Kebûdvend kete rojeva civînê, piraniya beşdaran piştîvanî ji pêşniyarbiryara PENa Kurd li ser serbestberdana derhale Kebûdvend kirin. Di wê derbarê de biryar hate girtin ku PENa Navneteweyî bi awayek fermî daxwaz ji rêjîma Îranê bike ku rêzdar Kebûdvend demek ji ya din zûtir serbest berde.

Komîteya Nivîsakrên di Girtîghean de bi awayek serbixwe jî pêşniyarbiryarek di derbarê siyaseta Turkiyê li dijî raya azad amade kiribû ku di wê de pilana saziyê ji bo çalakiyek taybet li ser wê rewşê di dema pêşiya me de hatibû ragehandin. Şanda PENa Kurd di bas u niqaşên xwe de li ser wan mijaran, bal kişande ser pêla girtinên ku di bin navê têkoşîna li dijî qaşo terorê ji aliyê dewleta Tirk ve tê birêvebirin u ew hêriş weke têkoşîna li dijî Gelê Kurd bi nav kir. Di wê basê de bi taybet rewşa nivîskarê girtî, Mulazim Özcan (Miraz Ronî) weke mînak hate ber basê u agahiyên pêwîst di derbarê rewşa wî de ji Kongireyê re hatin ragehandin. Bi taybet li ser wê hindê tekez hate kirin ku nivîskarek weke Miraz Roni li jêr navê têkoşîna li dijî terorê hatiye girtin, di demekê de ku xebata wî bi awayê giştî tenê di warê nivîsandina pirtûkan, kultûr, wergêr u perwerdeya bi zimanê Kurdî bûye. Komîteya Nivîskarên di Girtîgehan de wê rewşa nivîskarê Kurd Miraz Ronî di dema pêş me de bêxe rojeva kar u xebatên xwe.

Bi kurtî şanda PENa Kurd bi awayek çalak karî mijarên di rojeva PENa me de li hemû civînan bîne ber basê u bala beşdaran bikêşe ser rewşa îroye Kurdistanê. Her wisan di basên giştî de, bi awayek berfireh rewşa nivîs u nivîserên Kurd di bin bandora rewşa siyasiye Kurdistanê de hate rojevê u bas li ser hate kirin.

Di Civata Giştiye Kongireyê de pêşniyarbiryarek ku ji aliyê PENa Kurd ve li ser Îranê hatibû amade kirin, bi yekdengî ji aliyê beşdaran ve hate pejirandin. Pişt re şanda me pêşniyarbiryara xwe di derbarê rewşa Sûriyê de, ku pêştir bi pêşniyarbiryarek giştîtir re ku ji aliyê PENa Danmark ve hatibû amade kirin kiribû yek, anî rojevê u ew pêşniyarbiryar jî bi yekdangî hate pejirandin. Pêşniyarbiryara PENa Kurd li ser mafê Ziman u daxwaza naskirina zimanê Kurdî weke zimanê fermiye gelê Kurd li Turkiye, bi dijberiya tunde PENa Turk u piştevanên wê weke şanda PENa Hollanda re rûbirû bû. Wê dijberiyê, rê ji ber yek ji niqaşên herî dirêje Civata Giştiye PEN International vekir u piştî nêzîk yek saetê u 5-6 basên têr ji aliyê PENa Kurd ve, pêşniyarbiryar ji aliyê piraniya beşdaran ve u tenê bi 2 dengên bêaliye Turkiye u Hollanda hate pejirandin. Bi wî awayî yek ji serkevtinên şanda PENa Kurd misoger bû.

Her wisan ji aliyê Komîteya Nivîskarên di Girtîgehan de u bi piştgiriya Desteya Birêveber ya PEN a Navnetewi pêşniyarbiryarek li ser rewşa sîstema Yasa u Dad li Turkiyê u bandora wê li ser rojnamevan u nivîskarên girtî hatibû amade kirin ku ji ber daxwaza PENa Kurd ji bo

www.arsivakurdi.org

# Perwerdeya bi zimanê Kurdî di yasaya bingehî a Turkiyê de hat redkirin

Serbarê xebata dûr û dirêj ya xortên gelê Kurd li Kurdistana Turkiyê de, heya niha xelkê Bakûrê Kurdistanê ji mafên xwe ên netewî bêpar in, û serberê vê yekê jî, wek netewe bi awayek fermî haşa ji hebûna wan hatibû kirin û di çanda hikûmeta Turkiyê de Kurd bi Turkên çiyayî dihatin nasîn. Sala 1983'an, di serdemê deshilata Jeneralan de, yasayek di parlementoya Turkiyê de hat pejirandin û li gor vê yasayê, bikaranîna ziman û peyvên kurdî bi tawan tê hejmartin, û cezayek yasayî jêre hat diyarkirin. Eva di demekê de ye ku ne di Welatê Turkiyê de, û ne jî di welatên din ên ku Kurd têde dijîn, bikaranîna zimanên biyanî bi tawan nehatiye nasandin û ceza pêre nehatiye diyarîkirin.



Moitesem Nûranî

Tund û tîjî û siyaseta haşa û înkarkirina gelê Kurd li Turkiyê de, xortên xebatkar ên kurd ji xebata ji bo bidestveanîna mafên wan ên rewa bêhêvî nekir. Xebata nevestiyayî û berdewam a şoreşvanên gelê Kurd li çiya, girtîgeh, şeqam û parlementoyê de, ji aliyekê û pêşveçûna pêvajoya demokratîzasyonê ji aliyê din ve, bandor xist ser siyaseta fermî a karbidestên Turkiyê û neçar man ku hinek ji siyaseta xwe a têkel bi tund û tîjî û dûr ji her cur lojîk û mentiqekê paşekêşê bikin.

Siyaseta şovînîstiya Komara Turkiyê li hember Kurdan di heyamên derbazbûyî de di gel guhertinê berbirû bû. Sala derbazbûyî di Rojnameya Taymz de gotarek hatibû nivîsandin ku, di sala 1991'an de, dema ku Leyla Zana di hilbijartinên parlementoyê de bi ser ket, seba vê ku sûnda xwe bi zimanê Kurdî xwar, û bi zimanê Kurdî axaft, ji aliyê dadgeha Turkiyê ve bi 10 sal hebsê hat mehkûmkirin. Lê niha dewleta Tirkan biryara qedexebûna zimanê Kurdî hildiveşîne û piştî heftiyekê, biryara han weke gelaleyekê diçe parlementoyê û li dor riftara digel gelê Kurd, Tirkan guhertinên zaf bi ser kiryar û riftarên xwe de anîne. Niha Kurd dikarin bi Kurdî biaxifin û guh bidin mozîka Kurdî û li filîmên Kurdî binêrin, kanala TRT6 bi zimanê Kurdî pirogramên xwe diweşîne.




Eve jî vedigere ser xebat û fîdakariya xortên Kurd, jiber ku Kurdên Turkiyê her di serdemê Şêx Seîdê Pîran, Dr. Foad, Şoreşa Ararat û Şoreşa Dêrsîm û herweha di xebata xwe ya nû de jî, ku PKK gelek bi xortî di qada xebata Bakûrê kurdistanê de heye, bandor xistine ser rejîma Turkiyê, û di pêşerojê de jî de, kurd wê li ser gehiştin bi armancên xwe ên netewî berdewam bimînin.

Li gor nûçeyan, Komîsyona Guhertin û Hemwarkirina yasaya bingehîn a Turkiyê, roja 12 Septambrê li Parlementoya wî welatî de, bi amadebûna nûnerên çar partiyên siyasî, civîna xwe ya fermî lidar xistin. Di vê civînê de nûnerê BDP'ê, pêşniyara parta xwe li ser danan û guncandina madeya mafê perwerde bi zimanê zikmakî di yasaya bingehîn ya Turkiyê de, pêşkêşî komisyonê kir. Ev madeya han bi vî awayî bû; yasa û mafê perwerdê bo tewahiya zarok û qutabiyên Turkiyê wekhev be û mafê her zarokek zimanê xwe ê zikmakî jî perwerdê bibîne.

Nûnerên sê partên AKP, CHP û MHP bi redkirina vê, rêgir bûn li ser danana madeya han di yasaya bingehîn ya Turkiyê de. Herweha Altan Tan nûnerê Amedê ku endamê Komisyona navbirî ye, ragehand ku pêşniyara me hatiye tomarkirin û biryar hatiye dan ku civîna dahatî a heftiyê, li ser mijara ziman li Turkiyê de be.

Herçend partiya deshilatdar û hevpeymanên wê, avakirina derseke dilxwazî bi zimanê Kurdî ji aliyê Hikumeta Turkiyê ve, wek pêngavek girîng û erênî bo çareseriya pirsa Kurd dinirxîne, lê Kurd dibêjin ku li cihê dersek du demjimêrî, li tewahiya xwendegehên kurdistana Bakûr de, dersxwanên Kurd divêt bi zimanê Kurdî biaxvin. Kurd dixwazin li tewahiya qonaxên xwendinê de, qutabiyên Kurd li baxçê zarokan ve bigre heya digîje zanîngeh û xwendinên bilin jî, ji zimanê Kurdî weke zimanê perwerdeyê mifahê wergirin, û dewlet jî, dibe tewahiya pêwîstiyên xwendinê li hemû xwendegehekê de dabîn bike, û hêsankarî bo dersxwanên Kurd bihê kirin û zarokên kurd bo xwendina bi zimanê Kurdî bihên handan.

---

Doma R:5

zêdekirina «nasnameya Rojnamevan u nivîskarên Kurd» di teksta amadekirî de, rê li ber niqaşên berfireh vekir. Di dawiyê de biryar hate dan ku raste di tekstê de nasnameya çi nivîskar u rojnamevanên girtî nayê bas kirin, lê şandek wê ji aliyê PEN a Navnetewi ve here Turkiyê u bi awayek taybet li ser rewşa rojnamevan u nivîskarên girtiye Kurd bi rayedarên Turkiyê re danustanê bike. Pejirandina wê biryarê u pilana PEN a Navnetewi ji bo serdana Turkiyê bêguman wê li ser rewşa nivîskarên giritye Kurd karîgeriyek erênî danê.

Bi awayek giştî, hemû pêşniyarbiryar u basên ku PENa Kurd ji bo kongireya PEN a Navnetewi amade kiribûn, bi awyake berfireh di kongireya PENa Navneteweyî de hem dengvedan u hem jî piştgirî bi dest xistin. Hevdem, li hemû rojên ku Kongire birêve diçû, şanda PENa Kurd bi nivîskar u şandên beşdar re hevdîtin pêk dianîn u rewşa Gelê Kurd, zimanê Kurdî, nivîskar u rojnamevanan u şerê li Kurdistanê ji bo beşdaran bas dikir.

Hem di bas u niqaşên Komîteyan de u hem jî di basên civîna Civata Giştiye kongireya PEN a Navnetewi de, gelek şandên PENên welatên weke Feranse, Alman, hemû welatên Skandînavî, Çek, Mecar, herêma Bask u gelek welatên Afrîqayî bi awayek cidî piştgiriya daxwaz u pêşniyarên PENa Kurd dikirin.

Ev di demekê de ye ku dewleta Turk çend heyva berî wê kongireyê pitir ji 300 rojnamevanên hemû welatên Afrîqayî, bi pare u îmkanên xwe dawetî Turkiyê kiribûn, bi qasî hefteyekê di hotelên 5 stêre de mîvandariya wan kiribû u ji bilî buhayê riya hatin u çûn u derdanên xwarin u vexwarin u man u geriyana li Turkiyê, hemû rojnamevan jî xelat kiribûn. Di kongireya îsal de beşek ji wan rojnamevanan beşdar bûn u ev bas bi awayek taybet ji şanda PENa Kurd re anîne ziman.

Hêjayî gotinê ye ku PENa Korea bi mîvandariyek li gor kultûra germe welatê xwe, bala hemû şandên mîvan kişand. Xizmetkariya ji dil ya bi dehan lawên xwebexş ku ji roja yekê ya Kongireyê re heya dawî, bê beramber bi şandên mîvan re bûn, rê u cî nîşanî wan didan u hêsankariyên pêwîst pêk dianîn pir balkêş bû. Şanda PENa Kurd di hevdîtina dawî de bi serokê PENa Korea re ku ji bo sipasdariyê pêk hat, ev germî u mivandariya dostane weke nîşaneyek ji nêzîkiya kultûra her du gelên Kurdistan u Korea Başûr nirxand. Di Kongireya îsal de PENa Lubnan ji bo cara yekê bû endamê PENa Navneteweyî. Her wisan nivîskarên Korea Bakûr ku li derveyî welat PENek serbixwe ava kirine, bi navê Navenda PENa Bakûrê Korea li Koçberiyê karî îsal bibe endamê fermiye PENa Navneteweyî.

Di heman civînê de Navenda PENa Yûnan, ji ber ku erkên xwe yên endametiye bi cîh neanîne, ji endametiya PENa Navneteweyî hate avêtin.Kongireya îsla her wisan serokênn hin komîteyan, endamên Desteya Birêveber ku dibûya bên hilbijartin u endamên Komîteya Lêkolînan hilbijartin. Her wisan hate ragehandin ku kongireya 89 ya PEN International wê di heyva Septembera 2013 de li bajarê Reykyavik, paytextê Îsland bê girtin. Naveroka biryarên PENa Navneteweyî ku bi destpêşxeriya PENa Kurd hatin pejirandin wê di daxuyanî u ragehandinên PEN International de verin weşandin u pişt re jî di malpera fermî ya PENa Kurd de belav bibin.

Di hevdîtinên cuda yên ku şanda PENa Kurd bi navendên PENên dost re encam danî, her du PENên Çek u Mecar bi awayên fermî PENa Kurd ji bo beşdarî di boneyên ku ew navend wê di dema pêşiya me de bi rêve bibin vexwandin. Şanda PENa Kurd her wisan bersiva pirsên li ser wext u şêweyê lidarxistina kongireya giştî ya Navenda PEN a Kurd da. Di wê derbarê de PENa Navneteweyî wê li benda bi cî anîna biryarên PENa Kurd be.

Bi giştî şanda PENa Kurd bi destek pir çû civînê u bi destkevtên bi nirx ji civînê vegeriya.




www.arsivakurd.org

# Rêberekî demokrat û çep



**Ehmed Şêrbegî**

Bas kirin ji kesatiya Dr. Seîd hewcehî bi derfetek zêdetir heye û li nivîsek kurt de ne mumkin e ez bikarim basa hemû aliyên jiyana wî bikim, lewre neçarim zor bi kurtî îşare bi nêrîna navhatî bikim ku bal min ya herî diyar û girîn e û ez dikarim bibêjim ku çarçove û stroktora hizrî a Dr. Şerefkendî li ser veyî ramanê şikil girtibû, ew jî hizra netewexwazî û kurdatiya navhatî bû.

Em hemû dizanin ku Dr. Seîd li çarçoveya malbatek niştimanparêze kurd da çavê xwe bi dunyayê re vekir. Hêj zarok dibe ku agirê şerê duyem ê cîhanî peşqelan dawêje. Nazîsm li Almanê û faşîzm jî li Îtalya şikestê dixwe. Hêza hevalbendan, anku supaha soviyetê li bakûr û Îngilîs jî li başûr xaka Îranê dagîr dikin. Reza şa li kursiya desthilata paşatiyê dikewe û tê dûrxistin, nermebayê rizgariyê li gelek li welatan de dest pê dike û hizra xweserî xwaziya gelên çewsandî û yek ji wan jî gelê kurd li Kurdistana bindeste Îranê vedigeşe û bi awayekê ku avabûna Komara Kurdistanê li Mehabadê lê dikewe.

Ji aliyê din ve Dr. Şerefkendî birayê biçûk yê Ebdulrehman Şerefkendî "mamosta Hejar"helbestvanê niştimanî ê Komara Kurdistanê ye. Tesîr û karîgeriya kesek wekî Hejar û dîtina hildana alaya komara Kurdistanê li ser dem û dezgehên hikûmetî û çûna bo qutabxaneya kurdî û xwendina bi zimanê zikmakî û bihîstina sirûda netewî a "Ey Reqîb" dibine sedem ku Dr. Şerefkendî her ji temenê zarokatiyê ve mejiyê wî tejî be û tevlî seqa û atmosfera siyasî û kurdatiyê be û yekem kewirê xîmê koşka kurdayetiyê li derûna wî de ava bibe. Bi awayekê çi wê dema ku dibe mamosta û li warên cur bi cur de ders gotiyê û çi wê demê ku bi kiryar tê qada xebatê û tekoşîna siyasî a xwe bi eşkere dest pê dike û paşan dibe kesê yekem ê hizbê. Ew hizra netewexwazî bi tewahî li rabûn û rûniştin û nivîsên wî de derdikewein.

Dr. Şerefkendî şehrezayiyek tewaw li ser dîroka kurd heye û xwendin û têgihîştinek zanistî li ser dîroka serhildan û têkçûna tevgerên kurd dixe berçav. Wî li pirtûka "kurte dîrokek li ser tevgerên kurd" de îşare bi sedemên serhildan, kêmasiyan û têkçûnên wan tevgeran dike, lewre li qada piratîk de nêrînek zanistiyane û realîstane mêzeyî pêşeroja kurd dike.

Dr. Şerefkendî bona dabîn kirina mafê çarenivîsa kurd li Îrana pêşerojê de naçe jêr alaya tu bereyekê ku aliyên vê eniyê bawerî bi çaresera mafê netewî nebin.

Zor bi lêbrawî hîlek sor bi ser hizra seltenet xwaziyê de dikşîne û bo hertim ew sîstem bo pêşeroja Îranê ret dike. Navhatî bi xwendinek hûr ku li ser vê têgihê hebû dizanî ku dabînkirina mafê netewî û diyarî kirina çarenivîsê li gel hizra paremayî a seltenetî li natebayiyê de ye û bi tu awayekê nikare xwe bi sîstema piloralîsma siyasî a gelên Îranê biguncîne.

Piştre jî zor lêbrawtir û zelaltir ji wê, li ser mafên netewî ên kurdan diaxive bêy wê ku tu şik û gumanekê bal kesekê biafirîne bi eşkere dibêje: Eva raste ku Îran bi dirêjahiya dîrokê ji yekîtiya netewên cuda cuda pêk hatiye, lê tu tiştek heta heta nine. Çi sedemek heye eger çend netewe piştî 1500 sal bihevre jiyanê, nebe ku ji hev cuda bibin û cuda ji hev bijîn? Mesela eslî ew rewşa ye ku niha li rojevê de ye.

Dr. Şerefkendî biwêrane û ji rûyê agahî ve bawerek tewaw bi serbexweyî û yekîtiya Kurdistanê heye.

Wê demê ku kesê yekem ê hizbê bû, bi bê tirs û nîgeranî ve alîkarê vê beşa kurdistanê bû ku hewcehî bi alîkariya hizba demokrat hebûye. Zaf caran li vî cihî ku hewce bûye bi qazanca netewî xistiye pêş berjewendiya hib ayetiyê ve, her çiqas ku li vê riyê de jî bac jêre daye.

Dr. Şerefkendî li rê û resma 10 saliya avabûna Radyo Dengê Kurdistana Îranê de dibêje:

Dibe em şanaziyê bi xwe bikin ku kurd in. Xebat bo mafên netewî, xebatek pîroz û rewa ye. Tenê kurde ku îro bi kiryar li qada siyasî a Îranê de bo azadiyê xwînê dirijîne û qurbaniyan dide. Ku waye tu kes nikare li Îranê de xwe bi ser kurdan de ferz bike. Ez wekî kurdekê ne li tu kesekê kêmtir im ne jî zêdetir...

Ew gotara Dr. Şerefkendî wê demê girîngiya xwe derdixe û erzişa wê derdikewe ku li vê serdemê de hêlên hizrî ên çepa kilasîk li çarçoveya sosyalîzma mewcûd de bal bi ser seqaya siyasî a Îranê de kêşa bû û bîra netewexwazî û diyarîkirina mafê çarenivîsê li nêrîna gelek hêz û aliyên Îranî ên ser bi vê rêbaza fikra paşketî û îrticaî de pênase dikir.

Dr. Şerefkendî li vê çeperê de jî bêy wê ku bikewe jêr givaşa van teoriyan, ji bîr û hizra netewexwazî bi hemû awayekê berevanî dikir û helwest digirt. Li dawiyê de rastî û duristiya vê hizra Dr. Şerefkendî ji hemû aliyekê re hat selimandin û derket û me dît ku çawa hesta netewî û serbixwe xwaziyê li nav gelên cemsera rojhilat de ku zêdetir ji 70 salan bêdeng û fetisandibûn, teqiya û bû bi sedema herifîna vê eniyê û cudabûn û avakirina dewleta serbixwe a xwe.

Bona wê ku vê basê bi dawî bînim dibêjim: şehîd dr. Sadiq Şerefkendî kurdekî demokrat û çep bi manaya tewaw a peyvê bû. Bawerek kûr bi avakirina civakek dadperwerane li ser bingeha sosyalîzma demokratîk hebû.

Bona vê meremê jî gelek biwêrane û lêbrawane piştewanî ji bîrokeya "kurte basek li ser Sosyalîzmê" kir ku ji aliyê şehîdê serkirde, dr Qasimloyê zana li Kongireya şeşemîn a partiyê de hate rojevê.

## Rojev

# Dîplomasiya Îranê

**N: Hemîd Aqayî**
**W: Rûken**

Şikest û sernegirtina gotûbêjên navbera Komara Îslamiya Îranê û welatên Rojawayî û bi tenê mana rejîmê li asta navnetewî de li pileya yekem de vedigere ser neşiyaniya dîplomatên Îranê, reh û rîşeya wan sernekevtina û nezanînan divêt em li dîplomasiya Komara Îslamiya Îranê û sîstema îdeolojîk û dînî ya wan de peyda bikin. Di vê babetê de nivîskar cehd kiriye ku rolê olê Îslamê li warê dîplomatîk û siyaseta dereke de bixe ber lêkolînê.

Li yek ji wan lêkolînan de ku li wan dawiyane de li aliyê beşa birêveberiya malî ya binkeya teknolojiya "Çongyo" li Taywanê de pêk hatiye, berhevdan û qiyas kirink li warê şêweya dîplomatîk ji hizirgeha mesîhiyet, Îslam û bodîsmê ve hatiye kirin. Ew lêkolîn nîşan dide ku bawerên olî û îdeolojîk li dîplomasiya Îslamiyetê de li çav mesîhiheytê gellek karîgerî û bandor li ser pêvajoya dîplomatîk hebûye. Herwesa derketiye ku dîplomasiya Îslamî bara pitir li ser baweriyên olî disekine.

Dîplomatên Misilman hêz û şiyanek pirr baş li dema karê dîplomasiyê de hene. Herbet ne li ser bingeha fakt û rastiyên rojê, belku li ser bingeha mentiq û hizra rawestiyayî li ser îman û bawerên olî. Dîplomatên mesîhî şêweyên sade û îhsasî lidema gotûbêjan de bikar tînin, lê dîplomatên Misilman bara pitir bi axavtinên giran dikevne nava gotûbêjan de.

Pêdaçûnek bi ser dîroka Îslamê ji dema peyda bûna Îslmaê ve nîşan dide ku olê Îslamê her demê tenê şêweyeke dîplomatîk û taybet bi xwe bilav dikir û teblîx jêre dikir. Dema ku pêxemberê Îslamê hêz û deshilata xwe li medînê de seqamgîr û qahîm kir, hinek nûnerên xwe şandin Îran û Misr û Hebeşê, û li nameyekê de daxwaz li wan kir ku olê Îslamê qebûl bikin, her çend wê demê ew yek resm û adet bû ku li dema destpêkirina gotûbêjên siyasî li navbera du dewletan de rêberên wan welatan hinek diyarî ji bo yektir birê dikirin, û bi vî awayî riya gotûbêjan vedikirin. Lê olê Îslamê her li destpêkê de dîplomasiya wê li ser bingeha gazî kirina xelkê ji bo Îslamê û bi gotinek din berfireh kirina Îslamê hate avakirn. Ew şêweya dîplomasiyê ji bo welatên derdor û heta deshilatên mezin ên wê demê ne tenê cihê nîgeraniyê bû belku bo wan deshilatan ku ayînê xwe hebûn, wek ragehandina şer bi dijî wan û wek deshilatxwazî dihate hisabê.

Lêkolîna li ser edyanêt Îbrahîmî bi başî nîşan dide ku pêwendiya Xwedê li gel pêxemberên wî, her car bi awayek taybet nebûye, li gorî mitonêt olî Xwedayê mezin Îbrahîmê Xelîl bo mozakire û gotûbêjan gazî dikir, da ku bi vî awayî bikare qewmên biberçav tawanbar ceza bike.

Piştî hezretê Îbrahîm pêwendiya Xwedayê mezin li gel pêxemberên xwe, wate di gel Mûsa, Îsa û Mihemed bi sê awayên curbicur bûye.

Firîmên Kilark lêkolerê dîroka mezheban, û danerê pirtûka bi navê mesebên mezin wan sê rastiyan weha şirove dike:

Xwedayê Mûsa hêzeke tirsnake ku her tim li nav bendên xwe de jiyanê dike û şirîkê tewaya rastiyan û şaşiyên wan e, xwedayê Îsa jî hinda serê wan e, û hem jî li nav derûna wan de ye, û xwedayê Hezretê Mihemed li hinda serê wan e û wek fermanrewayek reha bi wan re diaxive.

Heke Xwedayê Cihûyan bi her awayekê piştevaniya Cihûyan bike, Xwedayê Îsa jî wek xwedayek bexşende xwe di nav dilê wan de cih dike.

Xwedayê Mihemed li gel Xwedayê Cihuyan hewbeşiyên pitir hene, helbet ji bilî vê ku li nav esmanan de dimîne û ji riya şandina wehyê ve hukm û biryaran dide. Ew Xwedayê ku li gorî rewşa ku têde ye hem şer û hem jî aştiyê bi dana sozên çûna bo Beheştê warê şer'î didê, û bi tewahî pişta peyamberê Îslamê li her warekî de digre bona berfireh kirin û geşe kirina Îslam.

Mirov dikare kartêkirina ol li ser siyaseta li dîplomasiya li navbera dewletên Îsraîl û Komara Îslamî de jî bibîne. Her du alî jî qet sazişê nakin û bingeha dîplomasiya wan jî îdeolojiya wan e.

# Ferq û cudahiya sîstimatîk li dijî jinan di yasaya Komara Îslamî a Îranê de

Peyxam Hişmetî

Maşîna serkuta Komara Îslamî a Îranê bi hemû alavên ku di dest de hene, hewil dide ku ferq û cudahiya civakî zêde bike. Zêdebûna ferq û cudahiyê di Îranê de, ji serdemê bihêzbûna Komara Îslamî a Îranê û refrandoma yasaya bingehîn di 10'ê Xakelêweya sala 1358'an de dest pê dike û dibe beşek ji yasaya civakê.

Esla duyemîn ya yasaya bingehîn derheq yeksaniya jin û mêran, li gor nêrîna Îslamê ye û di wî warî de dibêje ku tewahiya takên civakê pêkhatî ji jin û mêran, weke yek ji yasayê mifahê werdigrin û ji tewahiya mafên însanî, siyasî, abûrî, civakî û çandî, bi liberçavgirtina desturên Îslamî mifahê werdigrin. Serbarê vê yekê yasayên hiquqî û cezayî di Komara Îslamî a Îranê de, tijî ye ji pesendkiriyên ku li gor yasayê, mirovatî û kerameta însanî ya jinê di Îranê de kêm dike.

Mixabin jin di Îranê û di çarçoveya yasaya bingehî ya xwedî ferq û cudahî de, ku digel yasayên mafê mirov û konvansiyonên nehêlana ferq û cudahiyên dijî jinan dijatiyê dike, serbarê vê ku piraniya mafên xwe ji dest dan, çi weke jin û çi weke dayîk xisarên zaf dîtine.

Komara Îslam bi hikumet û yasayên xwe, nêrînek li gorî sedsala navînî derheq jin û dayîkan di civakê de derdixe holê, û jinê dike bende û ewdek ku xwedayê wê yê biçûk mêr e, û dayîkbûna wê jî vedigerînin ser berdewamiya za û zêyan.

Dayîkek ku ji bilî sebr û zehmetiyên zaf û berdewam û helbet soza beheşta piştî mirinê jî, tu tiştek din nabe nisîbê wê. Eva di demekê de ye ku di weletên pêşketî de, jin rola mirovek serbest dilîze, û li jinbûn û li za û zêya xwe weke babetek xwezayî û civakî dinêre.

Di sedsaliya 21'an de ku di piraniya welatên cîhanê de, jin heta di birêvebirina hikumetê de xwedî rol in, û digel mêran berambe in, lê hikumeta Îslamî piştî ku dest bi ser welat de girt, bi bêşermiyek eşkere xwendin û şirove di wan rişteyê xwendinê de bo jinan qedexe kir, û yasayê ev ji hin perwerde û dersên wan riştan bêpar kirin.

Guhertina Baxçeyên zarokan bi nawendên mezhebî, bi liberçav girtina cudahiyên regezî, babetek din e ku peywendiyek rasterast bi rêgirtina ji jinan bo xwendina di zanîngehan de ye.

Berpirsyarên Saziya Bêhzîstiyê bi tenê îzna avakirina baxçeyên zarokan, telebeyên jin û heyetên mezhebî û mizgewtan didin, da ku bi vê mêtodê bikarin mêjiyê zarokên sê çar salî bi perwerdeya bi zorî a Quran û dersên mezhebî bişon û wan li gor îdolojiya dînî ya xwe perwerde bikin û bikar bînin.

Heya ku bikarin bi perawêzxistina jinan di nawendên perwerdeyê de li gor gotinên Ehmedînejad û Xamineyî derheq kontrolkirina nifûsê di Îranê de, li jinan maşîneke bê can û bê hizir bo za û zêyê çê bikin.

Di biryara dawî a Komara Îslamî de, ji aliyekê hezifkirina jinan di 77 rişteyên xwendinê de, li zanîngehan û ji aliyê din ve guhertina baxçeyên modern ên zarokan bo maktebxaneyên li gorî sedsalên navîn û sepandina mazheba hikûmetî bi ser zarokan de, peywendiyek organîk bi hevre hene, û eve jî vê yekê diselimîne ku hikumeta Komara Îslamî ji hizr û nêrîna sedsalên navîn pêk hatiye.

Hikumetek ku rojên despêka hatine serkara wê hevdem e digel sedsala giringîdan bi buhayên însanî û mafê mirov di cîhanê de.

Hikûmetek ku yasaya bingehîn ya xwe li ser esasê ferq û cudahiya regezî, mezhebî û çandî dabirêje û di kakil û cewherê xwe de, dijî carnameya cîhanî a mafê mirov e.

Di rastî de kiryarên mirovî û civakî yên ku rêberê Komara Îslamî û pêrewên wê, diruşma encamdana wê didin, bê bingeh û direwîn in.



## Îranê xelata kuştina Selman Roşdî zêde kir


**Rejîma Îranê nîv milyon dolar bi vê xelatê ve zêde kir ku ji bo kuştina Selman Roşdî nivîskarê bi esil Hindî ku niha li Birîtanya de dijî, berçav girtibû, û ew xelat gihande sê milyon û 300 hezar dolarî.**



Li gorî nûçeyan Şêx Hesen Saniî berpirsê "nawenda 15'ê Xurdad" û nûnerê Elî Xamineyî ev nûçe bilav kiriye. Wî herweha ragehandiye ku heke fetwaya kuştina Selman Roşdî bihata cîbicî kirin niha êdî tu kesî nedikarî bi karîkator û fîlîman bê hurmetiyê bi Îslamê bike.

Xomênî di sala 1988'an de fetwaya kuştina Selman Roşdî bi egera weşandina pirtûka bi navê Ayetên Şeytanî derkir.

## Xelata 25 milyon dolarî bo radestkirina Beşar Esed



**Yek ji fermandeyên Ertêşa azad a Sûriyê ragehand ku dijberên hikumetê 25 milyon dolar li hember radestkirina Beşar Esed bi zîndî yan jî mirî diyarî kirine.**

Ehmed Hicazî, yek ji fermandeyên ertêşa azad di gotobêja digel nûçegehaniya Anatoliyayê de ragehand ku, hijmarek ji sermayedarên Sûrî ên akincî li derve û hundurê Sûriyê, ku piştewaniya dijberên Eseb dikin, garantiya tehvîldan vî diravî kêşane stûyê xwe.

Navbirî eşkere kir ku seba parastina babetên ewlehî ew nikarin navê wan sermayedaran bînne ziman.

## 160 parlemanterên Îraqê bo cara duyemîn zewicî ne

**160 parlamênterên Îraqê piştî ku bûne endamê parlementoyê, bi awayek fermî bo cara duyêîn zewicî ne, û jina duyemîn ji xwe re anîne.**

Mihemed Xalidî biryarderê parlementoya Îraqê ragehand ku 60 endamên parlementoyê piştî ku di helbijaretinên sala 2010'an de, weke parlemanter hatin hilbijartin, bi awayek fermî jina duyemîn anîne.

Necîbe Necîb, endama parlementoya hevpeymaniya Kurdistanê, di parlementoya Îraqê de bi tundî rexne ji wan parlemanteran girt ku bo cara duyemîn zewicî ne.

Hindek ji parlemanteran jî pitir ji du caran zewicî ne, bi awayekê ku cuda ji wan 60 endamên parlementoyê, 100 endamên din jî bi awayên nihênî û nefermî ji xwe re jin anîne, ku beşek ji wan serkirdeyên kotleyên siyasî di Îraqê de ne.

Kesatiyên berçav ku piştî bûne parlementar, jinên din ji xwe re anîne, bi vî awayî ne;

-Elî Bapîr Wetman, Emîrê Komela Îslamî û Serokê Firaksiyona Komela Îslamî li Bexdayê

-Cewad Elşehîlî, Parlemanterê rewta Sedir

-Hemze Dawûd Selman, Parlemanterê Elîraqiye

-Eyad Salih Mehdî, Parlemanterê Tevgera Wîfaq

-Samî Eskerî, Parlemanterê Dewleta Yasa

-Elî Zarî, Parlemanterê Dewleta Yasa

-Falih Elsarî, Parlemanterê Kotleya Mowatinîn.



www.arsivakurdi.org

Hevpeyvîn: Qadir Peyrewî

Hejmar 191, 21'ê Îlona 2012

Simayîl Ercûmendî:

# Pêşmerge armancek ji pêşiya wî ye ku ew armance, amanca wî xelkî ye.



Ez simayîl Ercûmendî kurê Kerîm di sala 1347'an li gundê Sêwe Simaqa ser bi bajarê Şinoyê ji dayîk bûm. Ez her wek zarokên dinê çûm bo debistanê, heta pola yekê a paşnawendiyê min ders xwend.

Malbata me malbatekî hizbî bûn. Mameke min pêşmerge bû ku mixabin şehîd bû.
Sala 1363'ê piştî şehîdbûna mamê min, ez hatim nav refên şoreşê û bûm pêşmerge.

Dema xebata hizba demokrat bi aşkeray hate rageyendin, piştî demekî kêm rejîma xomênî êrîş kire ser Kurdistanê, êdî zulm û zoriya rejîmê dest pêkir û Kurdan çi mafeke xwe di wê rejîmê de bidestve neanî, seba vê zulm û zoriyê ez hatim bo nav şoreşê heta xwestên xwe û gelê xwe bidestve bînim.

Eva rastî ew e ku sextî ji jiyana pêşmergatiyê de zor in, eva ku dibêjin hizbayetî yanî sextî di warê jiyanê, sextî di hereketê, sextî di şoreşê de zor in, ji ber wê hinde em sextiya dikişînin ku xweşiyê bi dest bînin.

Eva ku em xebatê bo dikin armanca paşeroja em ye.

Dema em berev rûyê rejîmê dibûn, zor car hevalê me li qerax me şehîd dibûn, hestek wisa di min de pêk dihat ku heta ez mabim rêya wan şehîdan vala nehêlim.

Xelk û pêşmerge di rastî de yek in, yanî yek armanc, û yek bîr û bawer hene. Pêşmerge armancek ji pêşiya wî ye ku ew amance, armanca wî xelkî ye.

Lewra pêşmerge xweştewiyê xelkê ye, û xelk şanazî yê bi hebûna pêşmerge dike. Bi kurtî



bername û pirogiram û armanca wê hizbê xastekên xelkê ne, ev hizba di nav dilê wî xelkî de ava bûye, ji ber vê hindê hergav xelk pişt û penaya me bûne.

**_Dema ku Dengê Kurdistana Îranê nûçeyên Şehîdbûna hevalan bilav dikir ev ji me re nûçeyên herî nexweş bûn_**

Ez sala 1363'an bûme pêşmerge, sala 1366'an bûme hevkarê kadir, sala 1367'an dewreya destpêkê a kadriyê dît, û bûme kadir. Herwisa çar salan ez bêsîmçî bûm.


Sala 1370'î de mîna kadrê teşkîlatî kar kiriye. Sala 1372'an pileya derece sê min wergirt.

Sala 1372 heta 1377'an ez endamê komîte şaristanê û heyeta îcrayî bûm.
Herwisa cîgir tîp, kumîsrê deste, û pişka teşkîlata eşkere bûm.

Di jiyana pêşmergatiyê de zor xweşî û nexweî têne ser rê, û ji ber wê hindê bîranîneke xweş û nexweş ezê ji we re bas bikim.

Di jiyana pêşmergatiyê de zor caran radiyoya dengê Kurdistana Îranê nûçeyên şer bilav dikirin, gelek caran nûçeyên nexweş bilav dikirin ku me şehîd hene, eva bîreweriyên herî nexweş bûn.

Gelek caran jî radiyoya dengê Kurdistanê nûçeyên serkevtina hêza Pêşmerge bi ser hêza dûjmin de bilav dikir, ku eva jî bîreweriyek xweş li jiyana min ya pêşmergatiyê de bû.



## Ey ÇIYAYÊ AGIRÎ

Çi egîd hene di
sîngê te da
Çi evînan re bûyî
şahid
Serê te her tim
xemgîn, xemgîn
Ewr tije bûn

Tu mîna gula ku
BAZÎD bedew
dikir bûyî
Çûk, kêzik kevir
û ax
Di sîngê te de
radizan
Hema tenê ji min
re
Rûyê te
wergeriya yî bû
Lê min ça tu
hezkirî bû
Herkesî yarek
hezdikir
Ez ji te re
evîndar bûm
Herkes ji te
direviya
Ez dihatime te
Çima ev cihêtî
çima
ÇIYAYÊ AGIRÎ

Ebasê Bâzîdî

www.arsivakurdi.org

Hejmar 191, 21'ê Îlona 2012

# Bajarê Serdeşt ê



Mecîd Cinîkanlû



***Di gelek pertûkên dîrokî de hatiye ku Serdeşt di dema Mixulan da bi giştî carek din wêran bûye, lê dîsan xelkê ew der avedan kiriye. Herwisa gelek kel li nêz bajar û gundên derdorê hene, û eva jî nîşana vê yekê ye ku bajar hertim di metirsîya êrîşan de bûye.***

Bajarê Serdeştê yêk ji bajarên parêzgeha Urmiyê ye, ku dikeve sînorê navbera rojhelat û başûrê Kurdistanê. Serdeşt bi dar û çiyayên xwe yên ciwan dihête nasîn, herweha hewayê bajarê Serdeştê gelek xweş e.

Serdeşt ji dû pişkên serekî pêk têt, beşa Merkez û beşa Wezné, ku pişka çiyayî ew in: Alan, Bîjwe, Bask Kulse, Birîswe, Biriyacî, Bîwiran, Siflî, Milkarî, Nilas. Hijmara nîşteciyên bajar nêzîkî 120 hezar kes in, ku hemû jî kurd in.

Di gelek pertûk û belgeyan da hatiye nivîsîn ku bajarê Serdeştê cihê jidayikbûna pêxember zerdeşt e û gelek kes li ser vê baweriyê ne ku di eslê xwe de navê Serdeşt ji navê Zerdeşt hatiye wergirtin. Bajarê kevin yê Serdeştê li rex bajarê niha li rex rûbarê nêyzerû hatiye çêkirin. Gelek belge û destnivîs hene, ku li ser kevir û ketîbeyan hatine nivîsîn.

Hin nivîskar û dîrokazan dibêjin: Serdeşt ji dû peyvên (ser) û (deşt) pêk hatiye, ji ber ku li destpêka deştê de ye, ew nav danaye ser bajar. Serdeşt di dema êrîşên Ereban li ser Îranê ketiye ber êrîşa Ereban û hatîye wêrankirin. Gelek kes hatîne kuştin û bajar hatiye şewitandin ji ber ku bajarek sînorî ye, gelek caran wêran bûye.

Di gelek pertûkên dîrokî de hatiye ku Serdeşt di dema Mixulan da bi giştî carek din wêran bûye, lê dîsan xelkê ew der avedan kirîye. Herwisa gelek kel li nêz bajar û gundên derdorê hene, û eva jî nîşana vê yekê ye ku bajar hertim di metirsîya êrîşan de bûye.

Di Sala 1900'î a Zayînî de, bizavên kurdî hêdî hêdî serî hildane û dijî dagîrkeran şer kirine. Herêma Serdeştê jî ji ber cihê xwe yê sitratîjî û şiyanên parastina xwe, cihek gelek xweş ji bo berxwedana şoreşgêrên kurd bûye.

Li Serhildana Simkoyê şikak ve bigire heya şerê salên 1980'î yê partiyên kurdî dijî dewleta Îranê, herdem Serdeşt cihê xwe yê taybet hebûye, ji ber hindê jî rejîma Îranê gelek serbazxane di bajar û derdora bajar de çêkirine û bi rêkên cuda cuda hewil dane ku pêşiya bizavên kurdî bigirin.

Di dema ku şerê Îraq û Îranê li salên 1980–1988'ê çêbû, herêma Serdeştê gelek xisar dît, û Serdeşt kete ber êrîşa kîmyabaranê û gelek jin û zarok û mirovên bê tawan canê xwe ji dest dan. Ev kîmyabarana xelkê sivîl yê Serdeştê haya îro rojê jî li ser ceste û sirûşta bedw ya Serdeştîyan xûya dike û gelek birîndarên wê karesatê hene, ku heya îro rojê jî, ji aliyê dewletê ve tu alîkariyek bi wan re nayê kirin, û gelek belengaz bi derd û êşên xwe dimirin.

Di herêma Serdeştê de gelek cihên bedev û xweş hene ku gelê herêmê û Îranê, rojane serdana wan cihên xweş dikin û demekî xweş li nav xwezaya ciwan û rind ya Kurdistanê de derbaz dikin, Sûlava şelmaşê ku ava vê diçe nav rûbarê Zapê, her Sal bi hezaran kes li navend û bakûrê Îranê seredana vê sûlavê dikin û demên xweş li wir derbas dikin. Kaniya girawan, Geliyê bêwiran û bi sedan daristan û geliyên xweş yên din li vê herêmê hene ku bûne cihekî baş ji bo dahata xelkê herêmê.

Serdeşt bajarekî gelek kevin û dîrokî ye û her seba vê yekê jî gelek cihên kevin li bajar û herêmê de hene ku dîroka hin ji wan ji bo berê zayînê vedigere.

Kela Serdeştê ku dikeve ser çiyayê nêzîk bajar, hêj gelek ciwan maye û têk neçûye û li ser gelek keviran nivîsînên bizimarî dîyarin, ev nivîsîne jî nîşana vê yekê ne ku Serdeşt bajarek gelek kevn e.

Di sala 1993'an a Zayînî de girûpek ji lêkoleran li Alman li gel zankoyek Îranî seredana wan cihên dîrokî kirin û lêkolîn li ser wan cihan û nivîsan kirin, piştî wan lêkolînan derket, ku di dema Împeratoriya Mêdîya de xelk di vî bajarî de jîyane.

Gelek Kelên biçûk jî nêzîkî bajar hene, pir nivîsên ser kevir li derdora bajarê Serdeştê diyar in, lê mixabin rejîma Îranê qet û bi çi awayekê li ser wan şûnwarên Kurdan lêkolîn nekirîye û gelek caran rijêma Îranê asevarên dîrokî ku peyda bûne bi talan birine.

Çandin û bazirganî karê serekî yê nîştecyên bajarê Serdeştê ye, bi taybetî ji ber nêzîkbûna wê li gel Îraq û başûrê Kurdistanê, xelk bi rengên cudacuda karê bazirganyê dikin.

Hebûna avek zêde li Serdeştê jî ev derfet ji xelkê ra dirust kiriye, da ku bikarin bi rengek gelek baş çandinê bikin.




www.arsivakurdi.org

# Astengên Sînema û Sînemakaran



A: Eskender Ceiferî

Her li destpêka hatine serkara Rejîma Komara Îslamiya Îranê ve givaşên ji aliyê desthilatê ve bo ser hunermendan roj bi roj zêde bûn.

Di destpêkê de wisa dihat xuyakirin, ku Xumeynî naxwaze pêşkeşkarên keç an jin hebin û mêran jî li Televîzyonê de hema dikarîn bi awayekî bêne xuyakirin ku bi gotina Rejîmê kinc û peyvînên wan tevlî rewşên Îslamî dijatiyê tunebin!

Her ew rewşe bi ser sînema û sînemakaran de jî dihat meşandin. Di sînemayê de fîlmên ku bi gotina rejîmê, hîcab têde nehatiye bikaranîn, mafê weşandinê çinîne û heya tê, ew rewş bi ser Sînemayê de pir girantir dibe.

Ji aliyek din ve, ev sînemakar û rexnegirên sînemayê ku rexneyê ji desthilat û yasayên sînemayê digirin, dikevine jêr givaşê û mafê gelek tiştan ji wan tê sitandin.

Mêhran Mudîrî, heneksazê Îranî ji bo ku di Fîlma xwe a naskirî bi "Şebhayê Bererê" angu Şevên Berereyê de bahsa ji Şah û ji ser kar birina wî û hatina desthilatek nû bi zimanê Henekê kiribû, ji sîma angu Deng û Rengê fermî hate bê parkirin. Piştî demekî ku Mudîrî, Heneka xwe a bi navê "Qehwêyê Telx" wate "Qehweya Tal" çê kir, car din tevî belavkirina wê berhemê li Deng û Rengê fermiya Komara Îslamî Muxalîfet hatekirin û Mêhran bi neçarî, berhema xwe kire DVD û derxiste Firotingehên Fîlman.

Hin ji çalakên warê Sînemayê li ser vê bawerê ne ku Îkran wate derketina fîlmê bo cara yekê, ji serketirîn astengên li hember çalakên warê sînemayê ne. Hin ji sînemakaran heya qasekî ji îkrana fîlmên wan re arîşe tên tiraşîn ku mecbûr dimînin weke "Mistefa Kiyanî" ê Sînemakar, li rojek taybetî de bo mînak cejna Remezanê, wê fîlmê derxin holê, heya ku bikaribin ji xwe re dahatekî kêm, an jî xerca fîlmê car din bi destve bînin.

Ew givaşên ji aliyê nawendên pêwendîdar ve bo ser sînemayan heya qasekî ye ku çalakvanên çandî nikarin civînên xwe ên çandî û Wêjeyî, bi bêy îzna Îdareya Ferheng û Îrşada Îslamî angu Îdareya Çandî û Rêniwîniyên Îslamî li holên sînemayan û salonên Amfî tiatran de birêve bibin.

Di demên dawiyê de gelek ji çalakên warê Tiatr angu Şanoyê ji çoyîna bo nava sînemayê û leyîstin di nava fîlmên sînemayî de veqetiyan. Ev yek jî bi sedema vê yekê bû ku ev xebatkarên warê Tiatrê, dema ku xwastin biçin nava sînemayê de, ji aliyê hewzeya huneriya Tehranê ve bi wan re hate ragihandin ku divêt di dewreyên fêrkariyên sînemayê de beşdar bibin û piştî ku evna karî di Ezmûnê de serkeftinê bi destve bînin, dikarin biçine nava sînemayê de, û di fîlmên sînemayî de bi awayek fermî bileyîzin.

Eva jî di demekî de ye ku kesên ku dixwazin xebata sînemayî bikin, heke girêdayî navendên hikûmî angu navendên weke "Bunyadê Şehîd" û "Difaê Muqeddes" bin, dikarin ji bo li hevanîna fîlmên pêwendîdar digel Siyasetên rejîma Îslamî a Îranê, bibin xwediyê hewcehiyên weke Şehrekên Sînemayî û li gişt îmkanatan Mifahê wergirin û di dema derketina fîlmê de jî gelek rêz ji wan tê girtin, û bi giştî ew derhînerên ku karê Siyasî di berjewendiya rejîmê de dikin, dibin xwediyê sirwet û dahatek bê mînak.

Hin ji rexnegirên sînemayê li ser wê bawerê ne ku siyasîkirina sînemayê, bûye egera viya ku îdî meyla sînemakaran ji bo derxistina fîlman kêm bibe, ji ber ku derhînerek ku dixwaze fîlmekî bi berhem bîne, ji xwe piştrast e ku heku ew fîlm rexnegirê Hikûmetê be, wê digel arîşan berbirû bibe.

Li gor gotina Navendên Hikûmî, ew derhînerên ku bi dîjî Hikûmetê dixebitin, ji ewlehiya netewî re metirsîdar in û divê pêşiya çalakiyên wan bê girtin.

Sansor jî yek ji astengên berbirûyê derhîneran e ku navendên pêwendîdare hukûmî jêre dibêjin Mumeyêziya Sînemayê. Dema ku Derhînerek, Fîlmekî bi berhem tîne, heke ew film li jêr Sansor angu Mumeyiziyê derbas bibe, wê darêjtina fîlmê bi giştî tev hev bibe, û derhîner nekare mebesta xwe a sereke bigehîne. Gelek ji fîlmên derbasbûyî ji navenda sansor an Mumeyiziyê de, çîroka xwe a sereke ji dest dane, û bi vî awayî ku berhemhîner daxwazkarê firotina fîlmê bûye, ew film nayê firotin.



OSMAN BEYDEMIR:

## Zarokên Kurd şerm e ku Kurdî nezanin

**Osman Baydemîr serokê şaredariya Amedê dibêje ku heke "zarokên min bi min re Kurdî nepeyîvin, giriya min tê."**

Li gor "TRTTURK" Baydemir ji bo dersa Kurdî dest bi gavan kir, û div ê çarçoveyê de 35 zarokên ku temenê wan ji di navbera 3-6 salan de ne, dê werin perwerde kirin. Qîzîka Baydemir, Ranya'ya 5,5 salî jî dê di nav dersxwanan de cih bigre. Baydemir demek berê, pergala perwerdeya dersan rexne kiribû û gotibû ku zarokên min bi min re Kurdî neaxivin. Eyb û zilm e. Divê ev asîmîlsayon êdî bisekine."

Di demên bihorî de gelek givaş ji bo ser nivîskar û çalakên wêjeyî li Kurdistana Turkiyeyê de hebûne, lê hin çalakên Siyasî ji bo ku dersa Kurdî bê avavkirin, ji berîka xwe xeric dikin.



### Kaniya helbestan



## Xatirê te...

Ji bo evîna me ez vê helbesta dawî dinivîsim
Ez dixwazim bi vê helbestê te bîr bikim

Dibêjin ku tu dibî rêwî
Bê gûman ez ê jî bibim sêwî

Ji bo evîna me ez vê helbesta dawî dinivîsim
Ez dixwazim bi vê helbestê te bîr bikim

Dibêjin ku tu dibî rêwî
Bê gûman ez ê jî bibim sêwî

Dixwazim çend hêsrên çavan birjînim
Mixabin nikarim bigrîm

Li min wisa nenêre
Mesekine here
Êdî ne ji min hez bike ne jî min bifikire
Tu dizanî...

Wateya evînê te bi min da fêm kirin
Bi gotinekî te reng da jiyana min

Niha jî tu diçî
Lê bizanibe! Ez dibim nîvkuştî
Tu dizanî...

Dilê min ji min xeyidiye
Ji bo te deriyê xwe vekiriye
Xuya dike ku bi hêvî ye

Ez newêrim jê re rastiye bêjim
Ji ber ku ez dilê xwe nas dikim

Bila fêm neke ku êdî tu jê hez nakî
Ji xwe bê hebûna te xwîn vedirşe

Naxwazim dilê min bibihîse
Ji ber ku ji wendabûna te pirr ditirse
Bizanibe ku...

Min ji te hez kir
Ez ji te hez dikim
Ez ê ji te hez bikim
Xatirê te...

Çavkanî: nivîskar.com


www.arsivakurdi.org

Agirî

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye
Ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne

www.kurdistanmedia.com/kurdi
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat:
AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE
E - Mail: agiri2003@hotmail.com
agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com




# Keyfxweşî û giriya piştî biryara dadgeha Mîkonosê




www.arsivakurd.org